Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1059 | 26-Nisan-2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
☎ 423165

## Xebatên sînemayê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê geş dibin

**Li Bakur û Rojhilatê Suriyeyê xebatên avakirina sînemaya şoreşgerî û gihandina sînemavanan berhemên xwe didin. Heta niha bi dehan sînemavan hatine gihandin û nêzî 10 fîlm, rêzefîlm û belgefîlm hatine çêkirin.**



Tevgera Çand û Hunerê (TEV ÇAND) a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di çarçoveya pêşxistina sînemaya kurdî, xebatên atolyeyan didomî ne. Xebat ji sala 2015'an ve di bin sîwana Komîna Fîlman a Rojava de tên meşandin. Li Qamişlo, Kobanê û gelek deverên din atolye hatin vekirin, perwerde hatine dayîn û bi dehan kes tevlê bûn. Her perwerdeyek 3 mehan dom dike û dersên senaryo, derhênerî, xwendina fîlman, kamera, dîroka sînemayê, sînemaya kurdî, produksiyon, deng, ronahî û kostum-makyaj tê de têne dayîn.

Kesên ketin wan perwerdeyan jî, di çêkirina rêzefîlm, kurtefîlm û fîlman de cih girtiye. Wek encameke wan perwerdeyan heta niha belgefîlmên "Darên bi tenê" û "Şengal", fîlmên "Ji bo Azadiyê" û "Kobanê", rêzefîlmên "Tava Sor" û "Evîna Kurd" hatine çêkirin.

Fîlmê "Kobanê" di televîzyonên Stêrk, Rohanî, Çira, Aryen û Medya Haberê de hat weşandin. Rêzefîlma "Tava Sor" jî di Stêrk TV'yê de hat weşandin û rêzefîlma "Evîna Kurd" di Ronahî TV'yê de tê weşandin.

### Xebatên atolyeyê dıdomın

Komîna Fîlman a Rojava, wek berdewama xebatên pêşxistina sînameyê, atolyeyeke nû vekiriye. Atolyeyê li Qamişloyê 9'ê Nîsanê dest pê kiriye. Piraniya wan ciwan û xwendekarên zanîngehê, bi giştî 40 kes tevlê dibin û ber bi dawiya atolyeyê ve jî dê perwerdeyên branşan bên dayîn.

### Hedef avakırına akademıyê ye



Ji rêveberiya kargeha sînemayê Egîd Nûman diyar kir ku armanca wan a sereke ew e ku sînemavanan bigihînin û bi rêya sînemayê tevkariyekê bidin şoreşa civakî. Nûman got ew dixwazin sînemavanên xwe bigihînin û fîlmên xwe bi zimanê xwe çêkin.

Egîd Nûman anî ziman ku piranî ciwanên ji Kobanê û Serêkaniyê tev li atolyeyan dibin; ev jî nîşan dide ku ciwanên encamên şer baş dizanin, eleqeyeke mezin nîşanî sînameyê didin û dixwazin xeyalên xwe di sînemayê de vebêjin.

Her wiha li gorî agahiyên ku Nûman dane, hewl didin van xebatan berfireh bikin û veguherînin akademiya sînemayê.

## Sira dirêjiya emrê betona Romayê hat keşfkirin

**Zanyarên Swîsreyî ku lêkolîn li ser avahiyên dîrokî yên Romayiyan kirin, keşf kirin ku avahî çawa bi hezaran sal in ku hilnaweşin.**

Komeke lêkolînerên Swîsreyî, li qada arkeolojîk a Prîvernoya nêzê Romayê lêkolîn kir li ser nimûneyên dîwarên



beton ên du hezar salî.

Li gor lêkolîna li kovara Scîence Advancesê hat weşandin, bi analîzên bi tîrêjên X'ê hatine kirin, derket holê ku kilsa nevemirî û beton bi germayî bi hev re li hev hatine xistin.

Li gor encamê, saxlemiya betonê ji agregayên mezin ên kilsê ye ku pê cihên vala tên girtin, wek kalsiyûmê ne.

### Kapasîteya xwe ya xwe başkirinê

Kalsiyûm û madeyekê din ê ku ji aliyê Romayiyan ve hatiye bikaranîn, bandorê li hev û din dikin. Ango kalsiyûm bi pozolana re ku tehtekê volkanîk e, dikeve reaksiyonê û bi demê re tiştên krîstal ên yekcar heşk jê çêdibin.

Bi vî awayî beton hêj heşktir dibe. Li gor lêkolînerên îdia dikin bi xwe spartina vê lêkolînê ji bo betonê xwe bi xwe geşe bi reçeteyên xwe dane, agregayên kilsê ku bi ava di ber derzên betonê re diavêjin, beton dikare xwe bi hezar salan nû bik

## Bi fikrên nû kilîpeke nû bi navnîşan `Li herî jorê`



**Hunergeha Welat bi hevkariya Saziya Parkîn kilîpeke nû der bar berxwedana gerîla de li hember êrişên qirkirinê li Herêmên Parastinê yên Medyayê derxist.**

Saziya Parkîn û Hunergeha Welat li ser sosyal medya kilîpeke nû bi navnîşan "Li herî jorê" belav kir. Hunermend Îbrahîm Feqê û Şêro Hindî gotinên stranê nivisîne û muzîkjen Mehmûd Berazî saz û awazên wê amade kirine. Her wiha hunermedn Şervan Badînî stranê dibêje.

Têkildarî peyama kilîpê, endamê Saziya Parkîn, Îbrahîm Feqê got: "Di demên dawîn de li dijî Herêmên Parastinê yên Medyayê û Kurdistanê, êrişên dijwar pêk tên. Ev jî erkek da ser milê me ku em di aliyê hunerî de bersiva wan êrişan bidin."

Her wiha Feqê wiha domand: "Me xwest di vê pêvajoyê de li gorî nirxên xwe yên pîroz bersivê bi-



din." Amedekirina kilîpê li Navenda Hunergeha Şehîd Welat derdorê mehek û nîvê dewam kir.

Sudoku: Bersiv 68

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 3 | 5 | 4 | 6 | 7 | 8 | 1 | 2 |
| 8 | 4 | 2 | 9 | 5 | 1 | 7 | 6 | 3 |
| 6 | 1 | 7 | 2 | 3 | 8 | 9 | 5 | 4 |
| 1 | 5 | 4 | 7 | 2 | 9 | 3 | 8 | 6 |
| 3 | 2 | 9 | 8 | 1 | 6 | 4 | 7 | 5 |
| 7 | 6 | 8 | 3 | 4 | 5 | 2 | 9 | 1 |
| 4 | 7 | 1 | 5 | 8 | 3 | 6 | 2 | 9 |
| 2 | 8 | 6 | 1 | 9 | 4 | 5 | 3 | 7 |
| 5 | 9 | 3 | 6 | 7 | 2 | 1 | 4 | 8 |

Sudoku:Pirs 69

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 4 | | | | | 5 | 6 | 3 |
| | 6 | | | | | | | |
| | 7 | 5 | | 3 | 2 | | | 8 |
| | | | 2 | | | | | 6 |
| 5 | 3 | | 7 | | 6 | | 1 | 2 |
| 8 | | | | | 3 | | | |
| 6 | | | 1 | 4 | | 7 | 2 | |
| | | | | | | | 3 | |
| 1 | 5 | 7 | | | | | 9 | |

### Quncika Têgînan

| Damezirandin | Avakirin, sazkirin: Salvegera damezirandina Komara Kurdistanê. |
|---|---|
| Damezirîner | Kesê ava kirî: Damezirînerê komarê li meclisê sond xwar. |
| Diyarker | 1. Kesê ku tiştekî dide zanîn. Xuyaker, ronker, zelalker, ragihîner. 2. Kesê yan tişta bingehî. |
| Hevrê | Kesên ku hizir û baweriya wan weke hev. Bi taybetî di siyasetê de. |
| Mayînde | Tişta ku demdirêj dimîne. Xurt, qayîm. |
| Pejirandin | Qebûlkirin. Pejirand, ango qebûl kir. |
| Rêxistin | Komek mirovên ji bo heman armancê bi hev re dixebitin. Organîzasyon, sazûman, teşkilat, kom, partî, hizb: |
| Senato (Îtalî) | Li hin welatan li gorî temen û perwerdeya endamên parlamentoyê, meclisa hatî avakirin. Ciyê ku senator lê kom dibin. |
| Senator (Îtalî) | Endamê senatoyê. |
| Tengav | 1. Ciyê teng yê av tê re derbas dibe. 2. Kesê ji bo tiştekî ketî tengiyê: Ez ji bêperetî tengav bûme. 3. Kesê destava wî ya piçûk tê. |

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1059 | 26-Nisan-2023 | www.ronahi.net/ku/



Polîsên Tirk 11 rojnamevan destgîr kirin.R-3



### "Beyannameya Rêveberiya Xweser kilîta çareseriya kirîza Sûriyê ye"

Siyasetmedar û nivîskarên bakur û rojhilatê Sûriyê diyar kirin ku beyanameya Rêveberiya Xweser ya ku di 18'ê Nîsanê de hat ragehandin bingeha çareseriya kirîza Sûriyê ye.R-4



### Rîhan Loqo : Armanca êrîşên dagirkeriya Titk qirkirina Kurdan e

Rîhan Loqo diyar kir ku dewleta Tirk ya dagirker bi êrîşên xwe yên hovane dixwaze gelan û bi taybet gelê kurd qir bike û got "Erdogan dixwaze bi êrîşhê ser kurdan dema desthilatdariya xwe dirêj bike û di hilbijartinê 14'ê Gulanê de bi ser bikeve.R-2

# DI ROJA ŞEHÎDAN DE SOZA TOLHILDANÊ

QSD`ê diyar kir ku êrişa dewleta Tirk a li dijî Qereçoxê ya 25'ê Nîsana 2017'an, hevkariya dewleta Tirk û çeteyên DAIŞ`ê eşkere kir. Her wiha destnîşan kir ku dewleta Tirk a dagirker hîna bi awayekî hovane êrişî herêmê dike û gefê lê dixwe. R-3




### "Civaka Êzidî bi ramanê Rêber Apo wê bi serkeve"



Êzidiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê da zanîn ku êrişên artêşa Tirk a dagiker li ser Şengalê encama têkçûna siyaseta wê ya qirker e û gotin, "Dijmin û kurdên xwefiroş nikarin me tune bikin, em ê bi fikir û felsefeya Rêber Apo biserkevin"R-6

### "AKP'ê, kirîzên Tirkiyê û Rojhilata Navîn gurtir kir"



Serokê Partiya Çep a Kurd li Sûriyê Mihemedê Mûsê diyar kir ku serkeftina Partiya Çepên Kesk wê bibe bingeha qunaxeke nû li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê û got, AKP'ê Tirkiyê ber bi hilweşandinê ve bir û kirîzên Rojhilata Navîn gurtir kir.R-5


### Ji heman malbatê 7 bira tevlî QSD'ê bûn



Li herêma Dêra Zorê ji êla egêdat gelek xort tevlî QSD`ê (Hêzên Sûriya Demokratîk) bûn û li hemberî çeteyên DAIŞ`ê şer kirin. Malbata Cûma El-Selame yek ji malbatên ku ciyê xwe di rizgarkirina Dêra Zorê de girtin û bûn xwedî Şoreşger û Şehîdan. R-6

Zekî Bedran
**Mehmûd: Divê ci** R-5

Ahmed Aktaş
**Dijberiya DYE û Çînê dewam dike** R-4



Farûk Sakik
**Heger Erdogan neçe!!!!!** R-5



Hafiz Ahmet
**cejn, azadî û aşıtıyê bîne** R-6



# Rîhan Loqo : Armanca êrîşên dagirkeriya Titk qirkirina Kurdan e

Rîhan Loqo diyar kir ku dewleta Tirk ya dagirker bi êrîşên xwe yên hovane dixwaze gelan û bi taybet gelê kurd qir bike û got “Erdogan dixwaze bi êrîşhê ser kurdan dema desthilatdariya xwe dirêj bike û di hilbijartinê 14’ê Gulanê de bi ser bikeve.

**Norşîn Sîno / Qamişlo**



Piştî têkçûna DAIŞ’ê li bakur û rojhilatê Sûriyê, herwiha bi armanca şikandina vîna gelan ,bi taybet gelê Kurd û têkbirina projeya Neteweya Demokratîk di heman demê de pînekirina aloziyên di hundirê Turkiyê de, dewleta Tirk ya dagirker êrişên xwe yên ser Rojava, Qadên Berxwedanê yên Gerîlayên Azadiyê, bênavber didomîne. Di nava bêdengiya cîhanê de, artêşa Tirk ya dagirker êrşên xwe yên ser tevahiya Kurdistanê zêdetir dike û li dijî Qadên Berxwedanê tevî çekên giran , çekên kîmyawî jî bikar tîne. Ji bo qirkirina gelê Kurd çi ji destê wê tê, dike.

Bi nêzîkbûyîna hilbijartinên 14`ê Gulanê yên Serokkomarî û perlementoya Turkiyê, Erdogan dixwaze bi êrîşên xwe xwe xwedî hêz nîşan bide da ku di hilbijartinên Turkiyê de bi ser bikeve û hê qirêjî ,xwîn rijandin û destlatdariya xwe bidomîne .

Derbarê êrîşên hovane yên dewleta Tirk ya dagirker ,berdevka Giştî ya Kongra Star Rêhan Loqo ji me re axivî.

**‘ Armanca dewleta Tirk qirkirina gelan e’**

Rîhan Loqo diyar kir ku armanca dewleta Tirk ya dagirker ji êrîşên li ser bakur û Rojhilatê Sûriyê herwiha herêmên medya û tevayî Kurdistanê , qirkirina gelane û wiha axivî: “Dema em li ser êrîşan biaxivin divê em vegerin dîroka yên êrîşê dike û yên êrîş li ser wan tê kirin. Em hemû dizanin dewleta Tirk destlatdar e û dixwaze hemû gel di bin destê wê de bin, ji bo vê jî naxwaze gelên derdora xwe bi tevayî bi azad jiyan bikin û bi heman şêwazî êrîşî gelê Kurdistanê bi taybet gelê kurd dike . Û dixwaze me qir bike da ku destlatdariya xwe



demdirêj bike.”

**‘Dewleta Tirk ji berxwedana jina Kurd ditirs e’**

Rîhan Loqo dazanîn ku berxwedaniya gelê Kurd bi taybet jin bûye metirsiya Tirkiyê , lewma fermandar herwiha jinên kedkar dike hedefa êrîşên xwe yên hovane û wiha axaftina xwe domand: “Berxwedaniya ku ji aliyê me li hemû parçeyên Kurdistanê tê kirin bûye metirsiya dewleta tirk , ji ber wê ji bê hêzbûyîna xwe êrîşên bi heman şêwazî li ser me dimeşîne ,bi taybet jinên kurd yên ku mejiyê wan ji destlatdariyê hatiyê şuştin û kedên bi salan dikin dike hedef . Dixwaze berxwedaniya me têk bibe lê hewildanên wan vala derdikevin .”

**`Em ê li berxwe bidin da ku destlatdar têk biçe `**

Berdevka Giştî ya kongira Star Rîhan Loqo diyar kir ku ewê li berxwe bidin , herwiha daxwaz ji gelê Bakurê Kurdistan û Tirkiyê Kir ku dengê xwe bidin Partiya Çepên Kesk da ku di welatekî azad de bijîn û wiha axaftina xwe bidawî kir: “Em ê heta dawiyê li berxwe bidin da ku em destlatdariyê têk bibin , herwiha em bang li gelê xwe yên Bakurê Kurdistan û Turkiyê dikin ku dengê xwe bidin Partiya Çepên Kesk, da ku em bi ser bikevin û di Kurdistaneke azad de bijîn”

# TAJÊ encamnameya konferansa xwe aşkere kir

**TAJÊ encamnameya konferansa ku li Şengalê bi dirûşma “Bi jin jiyan azadî re ber bi şoreşa jinan ve” hat lidarxistin aşkere kir.**



Li Şengalê konferansa jinan bi dirûşma “Bi jin jiyan azadî ber bi şoreşa jinan ve” ku ji aliyê Tevgera Jinên Êzidî TAJÊ ve hat organîzekirin bi beşdarbûna 350 delege û hejmarek zêde jinên Êzidî û Ereb li Şengalê bi coşeke mezin hat lidarxistin.

**Encamnameya komferansê wiha ye:**

“Me weke TAJÊ di 23’ê Nîsanê de bi beşdarbûna zêdetirî 350 delegeyan konferansa xwe li dar xist. Mêvanên ji Bexda, Başûrê Kurdistanê û Almanyayê jî tê de amade bûn. Mêvanên ku wê ji Rûsya û Rojava beşdarî konferansa me bibûna ji aliyê hukumeta Iraqê ve hatin astengkirin. Dîsa beşdarên ku xwestin tevli konferansa me bibin lê derfet nedîtin; jinên Êzidî yên ji Ermenistanê, siyasetmedara Êzidî Feleknas Uca, ji Lubnanê ji Însiyatîfa Nû ya Azadî Ji Bo Ocalan parêzer Sosin Şoman, ji Rûsyayê jinên Êzidî û Yekitiya Jinên Êzidî ya Rojava bi dîmen beşdar bûn. Endama Konseya Serokatî ya Giştî ya KCK Sozdar Avesta jî bi peyameke bi dîmen tevlî Konferansê, ji bo azadkirin û rêxistinkirina jinên Êzidî girîngiya fikir û felsefeya Rêber APO anî ziman. Di nav semînerên ku hatin dayîn de gelek peyamên girîng derketin pêş. Herî zêde jî bi fikir û felsefeya Rêber APO israra jinên Êzidî di azadiyê de hat nîqaşkirin. Têkoşîna Rêber APO ya di azadkirina jinê de îro êdî di şexsê jinên Êzidî de jî encamên şênber digire.”

**Wê jin li dijî tecrîdê têbikoşin**

Di heman demê de mijara ku jinên Êzidî jî ji bo şikandina tecrîda li ser Rêber Apo xwe berpirsiyar dibînin derket pêş. Dîsa biryardariya ji bo lidarxistina çalakiyên azadkirina fizîkî ya Rêber Apo têkoşîn bide û kar û xebatan bimeşîne hat nîşandan. Biryara kongreya TAJÊ ya 2. a ‘Ji bo fikir û felsefa Rêber Apo bê fêmkirin kar û xebat dimeşîne, êrîşên li hemberî Rêber Apo wek êrîşen li hemberî xwe dest digre û helwestê datîne’ derket pêş. Pêşkêşiya Jineolojiyê weke zanista jinê di konferansê de mijareke ku bal li ser hat kişandin bû. Di heman demê di konferansê de jinan bal kişand ser girîngiya rêxistinkirina jinên ciwan, parastina cewherî ya jin û destkeftiyên şoreşa jin li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê.

**Jin wê têkoşîna azadiyê bilind bikin**

Tevlibûna jinên Kurd, Ereb, Mesîhî û Êzidî ya konferansê careke din nîşan da ku jin ji kîjan netew, ol û baweriyê bin jî dikarin di fikir û felsefeya Rêber APO de bigihîjin hev û têkoşîna azadiya jinan bidin meşandin. Jinên ku li derdora dirûşma Jin, Jiyan, Azadî kom bûn dan diyarkirin ku wê li dijî her cure newekhevî, tundî, êrîş û desthilatdariyê heta dawiyê li ber xwe bidin û têkoşîna azadiya jinan mezin bikin.” **JÎNHA**

# Li hemberî çanda destdirêjiyê, rêxistinkirin çareserî ye

**Nehîr Pale**

**Du kalên ji Efrînê ji ber işkenceya çeteyên dewleta Tirk a dagirker gelek êş kişandin û jiyana xwe ji dest dan. Yek ji wan kalan Yehya Şukrî Hemo ye ku bi navê Ebû Şukrî tê naskirin û yê din jî Meimo Meimo ye.**

Kalê bi navê Meimo Meimo temenê wî 87 salî ye, ji gundê Çobana yê navçeya Raco ya Efrînê ye. Kalo û keça xwe Zeyneb Meimo ya 42 salî 7`ê Kanûnê sala 2021`an ve ji aliyê çeteyên Tirkiyê El-Hemzat El-Turkmaniyê ve têne işkence kirin. Kalo ji aliyê derûnî û fîzîkî ve, gelekî ziyan dibîne, êdî nema dikare ji nava livînan derbikeve û ew 18`ê Nîsanê 2023`an diçe ser dilovaniya xwe.

Yehya Hemo jî 17 salan ji kalê Meimo biçûktire û temenê wî 70 salî ye, ji gundê Îska yê girêdayî navçeya Şêrawa ya Efrînê ye. Roja 27`ê Adarê sala 2023`an çeteyên Feyleq El-Şam kalo digrin, wî işkence dikin, 300 dolarî û telefona wî jê distîn in. Çeteyên Tirkiyê bi wê işkenceyê hestuyên kalo li ser hevdû nahêlin û ew jî rewşa wî hingî giran dibe, nikare ji nava livînan derkeve û kalo di 16`ê Nîsana 2023`an de diçe ser dilovaniya xwe.

Li hemberî van buyeran bertekên demkî bi me re çêdibin û dibe ku em carnan hewil bidin ji bîr bikin, eger em ji bîr nekin jî em ê di hundirê xwe de xwe bixwin û her wicdanê me wê biêş e, her du rêbaz jî ne çareserî ne. Piştî ku bûyer qewimî em şîn jî bigrin, dibe ku em nikarbin ji êşa wicdanê xwe rizgar bibin.

Herdû kal û hemû şêniyên Efrînê ji sala 2018`an ve rastî qirkirin û çanda destdirêjiyê tên. Ji rê û rêbazên Tirkiyê û çeteyên wê tê fêmkirin ku hewl didin wê erdîngariyê û wî gelî ji kokê ve ziwa bikin û birizîn in. Raste Efrîna delal gelekî ziyan dît û bi sedan insanên xwe aliyê derûnî û fêzîkî ve wenda kirin, lê hêviya çareseriyê jî di astekî mezin de bi rêxistinkirinê ve girêdayî ye. Ji bo têkoşînkirinê dibe ku hejmareke mezin lazim neke, lê rêxistinkirin şert e. Rêxistinkirin parçeyekî herî girîng ê Şerê Gel ê Şoreşgerî ye. Eger em hemû pirsgirêkên xwe bidin aliyekî û xwe birêxistin bikin, dê kesek nikaribe nêzî me bibe. Bila êdî em şaş jiyan nekin, li beramberî kesên ku destdirêjî rûmeta me dikin, negrîn, alîkarî ji kesî nexwazin û hêviya xwe ji çareseriyê qut nekin.



# Rola sînemayê li ser avakirina nasnameyeke hevpar û nîşandana kêşeyên civakî: wek nimûne fîlmê bîrewerên li ser kevir

Pirosesa ku li Ewrûpayê bi Ronesans û Reformê dest pê kir, paşê jî bi Rewşengeriyê berdewamî da xwe û bandora li qada siyasî jî kir. Li Ewrûpayê bi bandora van bizavan hê di sedsala 17em de bandora monarşiyan lawaz bû û hêdî hêdî netewe-dewlet li şûna wan bi cih bûn. Pirosesa avakirina netewe-dewletan, serê pêşîn li Îngilistanê dest pê kir û piştre li Frensa û Germenistan û Îtalyayê belav bû; dawiyê jî li seranserê Ewrûpaya Rojava.

**Eyûb Firat**

Bingeha serekî ji bo avakirina netewe-dewletan “neteweyeke hevşêwe” ye. Ev neteweya hevşêwe, di destpêka serhildana netewe-dewletan de, li tu devereke cîhanê tune bû; ji ber vê yekê kesên ku ji bo etnîsîteyekê bi avakirina netewe-dewletan rabûn, dest bi hevşêwekirina neteweyên dîtir kirin di nav etnîsîteya armanckirî de. Ji bo berbelavkirina etnîsîteya armanckirî li ser axa ku lê desthilatdar in, berê xwe dan avakirina hevpariyên wek dîrok, ziman, hest, nasname û hwd. Ev piroses, kêm-zêde li ba wan miletan eynî bû ku dixwestin netewe-dewletekê di nav sînorên desthilatdariya xwe de ava bikin.

Komkirina xwîneran –takên neteweyekê- li dor çîrokekê yan li dor bûyerekê bi rêya romanê mimkun bû. Bi sedan xwîner li dor nîqaşa li ser sifreya şîvê di heman keliyê de kom dibûn dema ku heman roman dixwendin; ev yek jî bes bû ji bo ku mirov bibêje romanê cemaeteke xeyalî aniye pê li dor nîqaşekê ku di romanekê de heye (Anderson, 2014: 42). Bi heman awayî dema ku kesek nûçeyekî ji rojnameyekê dixwîne, bêyî ku haya wî jê hebe, hevhestiyek çêdibe di navbera wî û wan kesên din de ku heman nûçeyî ji heman rojnameyê dixwînin.

Piştî ku sînema bû amrazeke girîng ji amrazên ragihandina giştî (mass media), sînemayê ev rola roman û rojnameyê bi awayekî karîgertir girte ser xwe; ji ber ku temaşekirina fîlmekî asantir û leztir bû ji xwendina romanekê yan rojnameyekê. Di gel vî aliyê sînemayê, sînema bû qadek ji bo nîşandana kêşeyên civakî jî.

Bi mebesta derxistina rola sînemayê li ser avakirina texeyuleke hevpar ji bo bîneran, fîlmê Bîrewerên li ser Kevirî hatiye guftûgokirin ka çi hêmanên hevpar ên nasnameya kurdî di vî fîlmî de derketine pêş; her wiha hatiye guftûgokirin ka vî fîlmî çawa amaje daye kêşeyên sînemaya kurdî.

**Neteweperwerî û Netewe wek Cemaeteke Xeyalkirî**


Piştî Şoreşa Frensî, hêdî hêdî netewe-dewlet ava dibin. Berî netewe-dewletan padişahan her tişt li dor navendeke bilind rêxistin dikir û meşrûiyeta wan ne ji gel dihat, bile’ks ji pîrozatiyê dihat (Heman berhem, r. 33). Bes piştî sedsala 17em ev meşrûiyeta pîroz(asimanî) hêdî hêdî hate xwarê; vê yekê piştî Şoreşa Frensî hişt ku meşrûiyeta monarşiyan bi awayekî karîgertir bê nîqaşkirin. Lewma jî dema ku karîgeriya meşrûiyeta asimanî ya padişahan lawaz bû û hate nîqaşkirin ji aliyê gel ve, Anderson dibêje ku



“padişah ketin pey peydakirina palpiştiyeke ‘neteweyî’ ji bo meşrûiyeta xwe” (r. 36).

Piştî ku meşrûiyeta “meşrûiyeta asimanî” têk çû û gel wek çavkaniya meşrûiyetê hate qebûlkirin, êdî dengê neteweperweriyê her ku diçû gur dibû û bi demê re wisa lê hat ku bibe bîrdoziyek.

Ji bo ku ev bîrdozî serkeftî be, pêwîst bû ku takekesên civaka neteweyî xwe wisa hest bikin ku wekhev in li gel takekesên din ên civaka neteweyî bêyî ku wan nas bikin. Ji bo pêkanîna vê hestê jî pêwîst bû ku netewesazî(nation-building) li ser navê çandeke hevpar çîrokan dahêne û ciyawaziyên etnîkî homojenîze bike û bîrdoziya vê cemaeta xeyalkirî jî bi hemwelatiyan bide qebûlkirin (Ji Judanis veguhastin Aydos, 2009: 27). Vê



pirosesê jî hişt ku hesta “welatparêziya îroyîn” li nik takekesên civakê dirust bibe; ji ber ku destpêkê ev hest li nik gelan tune bû yan jî gelek hindik bû. Bi demê re û bi rêya “ziman, bajarîbûn, perwerde, leşkeriya neçarî û ragihandina giştî hesta welatparêziya hate dirustkirin” (Heman berhem, heman rûpel).

Di vê çarçoveyê de li ser hilhatina neteweyan Anderson dibêje ku “bi ruhekî entropolojîk ez ji bo neteweyê vê pênaseyê pêşniyar dikim: Netewe, komeke siyasî ye ku hatiye xeyalkirin; di heman demê de cemaeteke xeyalkirî ya wisa ye ku serwerî û sînordarî pê hatiye bexşandin” (2014: 20). Anderson li ser şirovekirina vê xeyalkirinê dibêje ku “xeyalkirî ye ji ber ku endamên neteweyeke herî biçûk jî endamên din ên neteweyê dê nas nekin û der heqê wan de dê tiştekî nebihîzin; lê belê dîsan jî di zihnê her endamekî de dê ev xeyal [netewebûn] hebe” (r. 20).

Ji bo ku ev “xeyalê netewebûn”ê li nik her endamekî civakê bê dirustkirin, pêwîstî bi hin amrazan heye. Bi derketina metbae, roman, rojnameyê û berbelavbûna xwendewariyê ev “xeyalê hevpar”, ku netewe ye, li seranserê “sînorên” welêt li nav gel belav bû.

Sînema wek amrazek ji ragihandina giştî, roja îro di demeke kurt de dikare “hemû” bînerên xwe bixe etmosfereke wisa ku bîner hest bikin ku hevpar in li gel “bîner”ên din ên civakê.

**Hêmanên Texeyuleke Hevpar di Bîrewerên li ser Kevirî de**

Sînemaya kurdî, ji ber bêstatûbûna kurdan, derfet peyda nekirine ji bo ku etmosfer(bazar)eke xwe ya navxweyî bîne pê. Encamên ku ji vê bêstatûbûnê derhatine, bo nimûne bêwelatî û sînor û mirin, reng vedane di berhemên sînemaya kurdî de. Nîşandana van mijaran –bêwelatî, sînor, mirin- wisa kiriye ku li nik bînerên kurd li dor van “hevpar”iyan hesteke hevpar dirust bibe. Ji ber tunebûna perwerde û medyayeke sertaserî ya kurdî, pirosesa netewesazî(xeyalî)yê li nik kurdan cudatir –heta zehmetir- bûye bi berawird li gel miletên din.

Fîlmê Bîrewerên li ser Kevir wekî gelek fîlmên kurdî bi nîşandana bêwelatî, sînor û mirin û zilmê, bîner li dor texeyuleke hevpar li hev civandine. Her çend desthilatdariyeke kurdî bi polîs û leşker û perwerdeya xwe xuya bibe jî di fîlm de, bi gotina “her çar parçeyên Kurdistanê” bîner wisa hest dike ku ew “bêwelatî” hêşta bi temamî berteref nebûye. Destewajeya “her çar parçeyên Kurdistan”ê gelek caran di fîlm de derbas dibe. Bo nimûne ekterê fîlm Alan di sehneyeke fîlm de dibêje ku “her çar parçeyên Kurdistanê dê lê temaşe ke” û di sehneyeke din de dema ku nûçebêjê TVyê behsa ekîba fîlm dike, dibêje ku “stafên vî fîlmî ji her çar parçeyên Kurdistanê ne”.

Têkildarî bêwelatiyê, ji ber ku kurd xudan statûyekê nebûne û hêzeke wan a wisa tune bûye ku xwe ji komkujiyên netewe-dewletên serdest biparêzin, gelek komkujî –heta jînosayd- hatine serê gelê kurd. Enfal yek ji wan jînosaydan e ku dewleta Iraqê aniye serê gelê kurd. Endamên Neteweyê ne tenê di rojên xweş û geş de dibin hevparên endamên din ên Neteweyê; her wiha dibin hevparên rojên reş ên endamên din ên Neteweyê. Van komkujiyan bi awayekî hiştiye ku li nik kurdan hesteke hevpar derkeve meydanê.

Çîroka fîlm ew e ku derhênerekî kurd piştî rûxana rejîma Sedam, dixwaze fîlmekî çêke ku mijara wî Enfal e. Hevhestbûna takekesên kurd li ser jînosayda Enfalê di fîlm de jî xuya dibe dema ku Hisên, Alan û Hejar diçin bo mala mamê Sinûr ji bo ku destûrê jê wergirin da ku Sinûr di fîlmê wan de bilîze. Mamê Sinûrê razî nabe, li ser vê yekê Hisên dibêje ku mijara fîlmê wan Enfal e; bi vê yekê dixwaze ku ji vê êşa hevpar destûrê wergire bo Sinûrê. Enfal di gelek sehneyên fîlm de derbas dibe dema ku stafên fîlm dixwazin alîkariyê bo fîlmê xwe wergirin. Mijara Enfalê ango mirinê rê li ber wê yekê vedike ku “hemû” endamên civaka kurd karker, walî, leşker, polîs, mamoste, hunermend, derhêner bêyî ku statûya wan a civakî bê nîqaşkirin di mijara Enfalê de dibine “hevhest”.

Fîlm dema ku dest pê dike leşkerên be’sî bi hinceta ku fîlmekî qedexe tê nîşandan, bi ser sînemaya bavê Hisên de digrin; heman sehne di “fîlmê qedexe” de jî heye. Ev her du sehne “weke ‘îro û duh’ bi hev re hatine hûnandin” (Zêdo, 2006: 182-186). Di fîlmê qedexe de ango fîlmê Rê yê Yilmaz Guney de, leşkerên tirk bi ser mala gundiyên kurd de digrin û çend mêrên kurd destên xwe li paş qemçika xwe girê didin û ji mala xwe derdikevin. Ev rewş dikare wek hêmanek ji wan hêmanan bê xwendin ku dibin alîkar di çêkirina texeyuleke giştî û hevpar a kurdî de.

Mijara sinûr (sînor), mijareke din e ku takekesên kurd tê de hevpar in. Ji ber parçebûna nîştimanê kurdan, her kurd bivê-nevê rûbirûyî vê diyardeyê bûye. Dema ku Hisên û Hejar diçin bo Îranê ji bo ku lîstikvana dewra sereke û wesayilên teknîk bînin rastî “sinûr” tên. Sînor dibe sebeb ku “derhêner û hunermend û karker û gundiyekî kurd” di yek tiştî de hevpar bin.

**Rengvedana Kêşeyên Sînemaya Kurdî di Bîrewerên li ser Kevirîde**

Ji bo ku bîner bikarin fîlmekî bibînin, divê ew fîlm yan li holên sînemayan bêne nîşandan yan jî li ser kanalên TVyê. Ev her du xal, holên sînemayê û kanalên TVyê, ji bo sînemaya kurdî hîna li gorî pêwîst nehatine pê. Fîlmên kurdî hem dema ku tên çêkirin rastî astengiyan tên û hem jî piştî ku hatin çêkirin di qonaxa nîşandan û belavkirinê de rastî astengiyan tên. Encama vê yekê ew e ku bîner nikare bigihîje wan fîlman; ji ber vê yekê jî gelek caran, bêyî ku fîlm ji aliyê hunerî ve lawaz be, çêkerên fîlman bi fîlmê xwe dixisirin.

Bîrewerên li ser Kevir kêşeyên rasteqîn ên sînemaya kurdî bi awayekî nîşan didin ku bîner pê dikenîne. Yek ji girîngtirîn kêşeyên sînemaya kurdî, tunebûna lîstikvanên kurd e ku bikarin bi kurdî biaxivin; nexasim jî tunebûna lîstikvanên jin e. Ev yek di fîlm de jî derbas dibe dema ku stafa fîlm dixwazin lîstikvaneke jin peyda bikin. Di fîlm de jinên ku dixwazin bilîzin malbata wan li ber wan dibe asteng ji ber “heya û namûs”ê. Mam û pismamê Sinûrê gelek caran bi gotina peyvên wek heya û namûsê dixwazin ku Sinûr di fîlm de nelîze.

Hebûna holên sînemayê bo fîlman gelek girîng e; ji ber ku di van holan de bîner dikarin fîlman bibînin. Dema ku Hîwa li Alan dide, ekîba fîlm careke din dikevin nav bêhêvîtiyê; di vê kêliyê de bavê Alan dibêje ku “ê baş e hûn vî fîlmî çêkin hûn dê lî kîrê nîşan bidin? Li vî bajêrî tenê êk sînema heye, ew jî dê xudanê wê xerab ket û bikete met’am”. Dema ku Hisên û Alan diçin ba xwediyê hola sînemayê, bersiva xwediyê hola sînemayê ev e: Sînema li Kurdistanê kar nake. Lewma jî dixwaze vê holê bigre û li şûna wê meta’meke tirkî veke.

**Wek Encam**

Sînema yek ji girîngtirîn amrazan e ji amrazên ragihandina giştî. Bi saya sînemayê endamên civakekê çi qas ji hev dûr bijîn û qet hev nas nekin û tiştek nebihîstibin jî der heqê hev de, dema ku fîlmekî temaşe dikin li dor etmosfereke hevpar kom dibin ku fîlm dirust kiriye. Sînemaya kurdî her çend bandora wê ne zêde be jî li ser civaka kurd kariye li dor mijarên hevpar –bêwelatî, sînor, mirin- kom bibe û bi rêya van mijaran hevpariyê ber pa bike di nav takekesên neteweya kurd de. Fîlmê Bîrewerên li ser Kevir jî bi hilgirtina van mijaran etmosferek çêkiriye ku bînerên fîlm di bin wê etmosferê de xwe wekhev bibînin li gel bînerên din.

**Çavkanî**


Anderson, B. (2014). Hayali Cemaatler Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması. İskender Savaşır (Çev.). İstanbul: Metis Yayınları

Aydos, S. (2009). Türkiye’nin Tanıtım Filmlerinde Ulusal Kimlik Anlatısı. (Teza doktorayê ya çapnekirî). Zanîngeha Enqereyê, Enqere.

Zêdo, Ç. (2016). “Ji Kevirên Sînemaya Kurdî: Bîranînên li ser Kevirî”. Kovara Zarema, hej. 8, sal: 2016, r. 182-186.

# “Civaka Êzidî bi ramanê Rêber Apo wê bi serkeve”

Êzidiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê da zanîn ku êrişên artêşa Tirk a dagiker li ser Şengalê encama têkçûna siyaseta wê ya qirker e û gotin, “Dijmin û kurdên xwefiroş nikarin me tune bikin, em ê bi fikir û felsefeya Rêber Apo biserkevin”

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Piştî rizgarkirina civaka Êzidî ya ji Fermana 3’yê Tebaxa 2014’an û ragihandina Rêveberiyên Xweser a Şengalê, hêzên Parastinê yên Şengalê YBŞ/YJŞ û Asayîşê Êzidxanê hatin avakirin. Lê li beramberî destkeftiyên gelê Şengalê, êrîşên dewleta Tirk a dagirker roj bi roj zêdetir bûn. Dagirkeriya Tirk û bi alîkariya PDK’ê êrêşên xwe yên ser Şengalê dewam dike. Di van êrîşan de pêşengên civaka Êzidî û têkoşerên kurd û kesayetên welatparêz dibin armanc.

Derbarê êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên ser Şengalê û planên li dijî civaka Êzidî, Êzîdiyên herêma Cizêrê ya Rojavayê Kurdistanê ji me re axivîn.



**`Armanca êrişan qirkirina civaka Êzidî ye`**

Hevseroka mala Êzîdiyan a herêma Cizîrê Leyla Ibrahîm diyar kir ku civaka Êzidî koka gelê kurd e, ji ber wê dijmin dixwazin di şexsê civaka Êidê de gelê Kurd qir bike û wiha axivî: “Di sala 2014` an de êrîşên qirkirinê li ser Şengalê hatin kirin. Armanca êrîşan qirkirina civaka Êzidî û tunkirina gelê kurd bi giştî bû. Lê ji ber ku planên dewleta Tirk a dagirker têkçûn û armanca wê pêk nehat, wê êrîşên xwe li ser



Şengalê zêde kirin. Civaka Êzidî gelek fermanan re derbas bû û her dem li ber xwe de, ne dewleta Tirk a dagirker û tu hêz di cîhanê de dikare Êzidiyan qir bike.”

**’Ne dijmin û kurdên xwefiroş jî dikarin Êzidiyan qir bikin’**

Hevseroka mala Êzîdiyan a herêma Cizîrê Leyla Ibrahîm da xuyakirin ku civaka Êzidî li ser fikr û felsefeya Rêber Apo xwe birêxistin kir û axaftina xwe wiha qedand: “Piştî paqijkirina Şengal ji çeteyên DAIŞ’ê, civaka Êzidî xwe birêxistin kir, Rêveberiya Xweser a Şengalê hat damezrandin, Yekîneyên Parastinê û Asayîş hatin avakirin. Civaka Êzidî serê xwe tu carê ji tu kesî re natewîne, wê herdem li ber xwe bide. Bi fikr û felsefeya Rêber Apo em ê biserkevin û dijminê xwe têk binin. Ne dijmin û kurdên xwefiroş jî dikarin Êzidiyan qir bikin.”

**`Bi fikir û felsefeya Rêber Apo emê bi serkefin`**

Welatiyê bi navê xelef Osê jî êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên ser Şengalê şermezar kir û wiha got: “Bi fermana dewleta Tirk a dagirker, çeteyên DAIŞ’ê di 2014’an de êrîşên qirkirinê li ser Şengalê dan destpêkirin. Çeteyan bi he-



zaran Êzidî qetilkirin û jinên Êzîdî revandin. Çeteyan xwestin ku civaka ji kokê rakin. Lê bi saya gerîlayên qehreman, YPG, YPJ û welatparêzên kurd Şengal hat paqijkirin û Rêveberiya Xweser a Şengal hat avakirin. “

**’Şengal wê bimîne kelemek di çavê dijminan de’**

çXelef Osê da xuyakirin ku dewleta Tirk a dagirker dixwaze qirkirina civaka Êzîdî a ku çeteyên DAIŞ’ê dabûn destpêkirin dewam bike û axaftina wiha qedand: “Dewleta Tirk a dagirker bi riya êrîşan dixwaze qirkirina civaka Êzidî dewam bike û tola çeteyên DAIŞ’ê hilîne. Lê bi fikrên Rêber Apo, berxwedana YPŞ`ê û YJŞ`ê , em ê bi ser bikevin. Tevî ku planên mezin ji aliyê dewleta Tirk û PDK’ê ve li ser Şengalê tên dayîn, lê wê tu carî nikaribin civaka Êzidî tune bikin. Wekî ku DAIŞ têk çû, wê dagirkeriya Tirk û kordên xayîn jî têk biçin. Şengal wê bimîne gelema di çavê dijminê gelê Kurd e.”

# Ji heman malbatê 7 bira tevlî QSD’ê bûn

**Nehîr Pale**

**Li herêma Dêra Zorê ji êla egêdat gelek xort tevlî QSD`ê (Hêzên Sûriya Demokratîk) bûn û li hemberî çeteyên DAIŞ`ê şer kirin. Malbata Cûma El-Selame yek ji malbatên ku ciyê xwe di rizgarkirina Dêra Zorê de girtin û bûn xwedî Şoreşger û Şehîdan.**

Cûma El-Selame sala 1958`an li bajarê Bo-Kemal ê herêma Dêra Zorê ji dayîk dibe. Bajarê Bo-Kemal dikeve ser sînorê Sûrî û Iraqê. Heyanî sala 2012`an pêkhateya Ereb, Kurd û Aşûr lê diman û di asta civakî û aborî de danûstandina wan xurt bû. Ava çemê Firatê ber bi bajarê Bo-Kemal re derbas dibe û piştî bajarê Dêra Zorê bajarê Bo-Kemal ê herî mezin e. Sala 2012`an şêniyên Bo-Kemal li hemberî Hikûmeta Şamê şer dikin û wan ji bajar derdixin, piştî wê çeteyên DAIŞ`ê sala 2014`an Bo-Kemal dagir dikin heyanî 2016`an û radestî Hikûmeta Şamê û komên çekdar ên Îranê dikin.

Di encama şer de hejmareke mezin ji gelê Bo-Kemal koçber bûn, çeteyên DAIŞ`ê ew bajar tarûmar kirin û niha jî komên çekdar ên girêdayî Hikûmeta Şamê û Îranê di bajarê Bo-Kemal de ne û li bajar tiştek li ser hevdû nehiştin e.

Cûma El-Selame piştî ku dizewicê 18 zarok (8 keç û 10 lawik) jê re çêdibin. Zarokên wî li Bo-Kemal mezin dibin û hinek ji wan li wir malbata xwe saz dikin.

**Têkoşîn ji Xalid destpê dike û bi Abdulah re fereh dibe**

Sala 2011`an piştî ku Bihara Gelan li Sûriyeyê destpê dike, hikûmeta Şamê bajarê Bo-Kemal bombebaran dike û yek ji kurê Cûma El-Selame yê bi navê Ehmed sala 2012`an tê kuştin, dîsa jî weke malbat ji bajarê xwe dernakevin heyanî ku çeteyên DAIŞ`ê bajarê wan dagir dikin.

Kurê Cûma El-Selame Xalid yê ku sala 1982`an ji dayîk bibû, ji ber zextên çeteyên DAIŞ`ê li ser wî û malbata wî, tevî hevjîn û keça xwe sala 2014`an derbasî herêma Girê Spî dibe. Li wêderê QSD`ê (Hêzên Sûriya Demokratîk) dinase û sala 2015`tevlî wan dibe. Beşdarî hemleya rizgarkirina Tebqa ji çeteyên DAIŞ`ê dibe û sala 2017`an li Tebqayê şehîd dibe.

Piştî ku çeteyên DAIŞ`ê agahî digrin ku Xalid El-Selame tevlî QSD`ê buye û li hemberî wan şer dike, zextê li malbata Xalid El-Selame dikin û malbat neçar dimîne ji bajarê xwe Bo-Kemal derbikevin û derbasî gundê Şaife yê herêma Dêra Zorê bibin.

**Bi navê Şehîd Xalid El-Selame foc ava dikin**

Bira, Ap û pismamên Şehîd Xalid El-Selame piştî şehadeta wî sala 2018`an focekî li xeta şerqî ya herêma Dêra Zorê ava dikin û nav lê dikin Foca Şehîd Xalid El-Selame. Gund bi gund digerin û xortan birêxistin dikin heyanî ku hejmara focê dighêje 1300 şervanî. Focê Şehîd Xalid El-Selame ciyê xwe di hemleyên rizgarkirina Dêra Zorê de digrin û niha jî di parastina herêmê de berpirsyartî radikin.

**Abdullah tevlî Tevgerê dibe û Wenes jî şehîd dibe**

Sala 2018`an Wenes El-Selame (Seqir) yek ji birayê Xalid El-Selame yê ku rêça wî şopand û tevlî QSD`ê dibe,




ew sala 1985`an ji dayîk dibe, heyanî dibistana navîn dixwîne û 3`ê zarokên wî hene. Sala 2019`an jî şehîd dibe. Abdullah El-Selame jî sala 2018`an tevlî Tevgera Azadiyê dibe, navê birayê xwe yê Şehîd Xalid radike. Ew sala 2001`an li bajarê Bo-Kemal ji dayîk dibe û ji ber şert û mercan nikare bixwîne.

Malbata Cûma El-Selame ji malbatên ku koletiyê napejirînin û ciyê xwe di nava têkoşînê de digrin. Ji malbatê du xort şehîd dibin, yek jî tevlî Tevgera Azadiyê dibe û 4 jî (Cabir El-Selame, Elî El-Selame, Selame El-Selame û Mihemed El-Selame) niha şervanên QSD`ê ne.



## cejn, azadî û aşıtıyê bîne

**Hafiz Ahmet Turhalli**

Cejn di hemû çand û miletan de hene. Ev cejn piştî serkeftinan an jî piştî destkeftan pêk tên. Di cejnan de hemû kes kêfxweş û dilgeş dibin. Di Cejnan de parvekirina xweşiyê çêdibe. Cejna Remezanê jî ji cejnên Olî yên Misilmanan e. Navê wî li ba me cejna Remezanê ye. Ji ber kû divê Heyvê de Qur’an nazil buye û têde guhertina civakê pêk hatiye, wek rojbûna Qur’ana pîroz tête pîrozkirin. Piştî Pêxember Muhemed koçî medînê kir, di sala duyemîn de ferziyeta Rojiyê çêbû û piştî îbadeta Rojî girtinê, Cejna Remezanê jî pêk hat. Ev meha kû bi Rojîgirtinê hate derbas kirin, di meha Şewalê hersê rojên destpêkê bûn rojên cejna remezanê. Liba Ereban navê vê cejnê Îdul-Fitre! Fitir hevkariyeke aborî ya bi muhtaç û xizana ye. Bawermendên ola Îslamê, beriya nimêja cejna Remezanê, divê vê hevkariyê ji bo muhtacan dabîn bike û bide xizanan. Di rojên cejnê de, divê hemû kes biçe serdana hev, kêfxweşî û coş di nava civakêde belav bibe, xeydan û dilşikestin nemîne. Kesên muhtaç û xizan jî di roja cejnê de, bi hevkariya aborî û manewî, kêfxweş û dilgeş bibin.

Ji ber van sedeman Rojîgîrtina rojên cejnê weke heram hatiye destnîşan kirin.

Lê sed heyf û mixabin; di cîhana Îslamê de pirsgirêkên bingehîn wek: Zilim, zordarî û xizanî berdewamin. Cejn ji bo bi rastî bibin cejn: Divê van pirsgirêkên heyî, bêne çareserkirin. Di cîhana Îslamê de yekem miletê Kurd, di bin zilim û zordariyê de jiyana xwe didomîne. Çar dewletên ku welatê me Kurdistan dagirkirine, jixwer dibêjin em bawermendên ola Îslamê ne, li welatê me kuştin, talan, işkence û zordarî bê navber didomin.

Neha li ser televizyonan behsa cejnê tê kirin, dibêjin, di cejnê de pirsa rewşa hevdû bikin. Dê û bavên xwe, mirov û xizmên xwe, cînar û derdorên xwe kêfxweş bikin. Lê ji bo me Kurdan bi sedan salane ev cejnên Olî, wateya xwe ya rasteqînî çênebû ye.

Di cejnan de bi taybet kesên ji xwere dibêjin em şopdarê Ola Îslamê ne, diviya roja cejnê li ser mînberan û di nava mizgeftan de behsa zilima li ser Kurdan biaxivin. Bêjin ku: Ev milet birayên me ne, divê hûn mafên wan bê nîqaş û bê guftûgo li wan vegerînin. Nabe hûn weke miletên serdest û desthilat mafên birayên meyên Kurd, ji wan bigrin û zilmê li wan bikin. Em vê rewşê qebûl nakin, we welatên wan perçe kiriye û hûn di navbera wan de mayînan diçînin, hûn nahêlin ew cejnên hevdû pîroz bikin.

Kurdên ku bawermendên ola Îslamêne û di nava van civakên dagirkeran de nimêjan dikin û rojiyan digrin, divê bi dengekî bilind ji wan re bêjin ma biratî ev e: Hûn cejnan bikin û kêfxweşiyan bijîn û li mejî bombe û mirinê bibarînin. Qey biratiya we ev e? Hemû tiştên we hebin û em jî ji her tiştî bêparbin!

Cejn divê bi serbilindî werin pîrozkirin. Nabe cejn bi dilşikestî û hustîxwar werin pîroz kirin.

Cejn divê bi azadî, aşitî, wekhevî, hevkarî û dadmendî werin pêkanîn. Çi gel, çi oldar û çi çîn dibin, divê cejnên wan bi wate werin pîrozkirin. Dema me ser xaka xwe cejnên xwe bi azadî û aramî pîroz kirin, wê deme wateya cejnan dê pêk were.

Li ser van hêvî û daxwazan cejna Remezanê pîroz be.



# QSD: Êrişa li Qereçoxê hevkariya dewleta Tirk û DAIŞ`ê îsbat kir

QSD`ê diyar kir ku êrişa dewleta Tirk a li dijî Qereçoxê ya 25`ê Nîsana 2017`an, hevkariya dewleta Tirk û çeteyên DAIŞ`ê eşkere kir. Her wiha destnîşan kir ku dewleta Tirk a dagirker hîna bi awayekî hovane êrişî herêmê dike û gefê lê dixwe.

**Navenda nûçeyan**

Salvegera 6`an a êrişa dewleta Tirk a dagirker a li dijî çiyayê Qereçoxê yê herêma Dêrikê ya kantona Qamişloyê ye. Bi vê wesîleyê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) daxuyaniyek da.

QSD`ê di daxuyaniya xwe de got: “Em 20 hevalên xwe yên ku beriya 6 salan di encama êrişa dewleta Tirk a li dijî Navenda Fermandariya Operasyona Leşkerî ya li dijî DAIŞ’ê û Navenda Ragihandinê ya Yekîneyên Parastina Gel (YPG) li Çiyayê Qereçoxê yê herêma Dêrikê şehîd bûbûn, bi bîr tînin. Me û gelê xwe di vê rojê de fermandar û şervanên mezin ên ku li hember hemû aliyên ku xêrê ji bo gel û axa me naxwazin, mîraseya berxwedan û fedakariyê li pey xwe hiştine winda kir.

Her wiha em helwesta welatparêzî û exlaqî ya birûmet a gelê me yê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di dema êrişa terorîst de ku li dijî terora Tirkiyeyê serî hildan û bi deh hezaran ber bi çiyayê Qereçoxê ve bi rê ketin û dilsoziya xwe ya



bênavber ji xwîna şehîdan re tekez kirin, bi bîr tînin û silav dikin. Ew helwesta welatparêzî bû yek ji nirxên bingehîn û mayînde yên vî gelî li beramberî şervanên me yên ku canê xwe ji bo parastina jiyana gelê xwe feda kirin.

Êrişa dewleta Tirk a li ser Qereçoxê, tişta ku di belge û vîdyoyan de li ser hevkariya eşkere ya dewleta dagirker û rêxistina terorîst a DAIŞ`ê û hemahengiya êrişên wan li ser herêmên me yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi armanca astengkirina têkoşîna me ya li dijî terorê piştrast dike. Ji ber ku hêzên me wê demê di qonaxên pêşketî de bûn, ji bo jinavbirina paytexta rêxistina terorîst Reqa, êrişên Tirkiyê alîkariya DAIŞ`ê kir ku bêtir dem bi dest bixe, refên xwe careke din birêxistin bike, da ku hewlên tinekirina wê asteng bike.

Hemwextî êrişa li ser Qereçoxê bi bîranîna salane ya qetlîama ku ji aliyê Tirkiyeyê ve beriya nêzî sedsalekê li dijî zêdetirî milyon û 500 hezar Ermenî bû. Dîroka hovane ya dewleta dagirker a ku li ser esasê tunekirina gelên resen hatiye avakirin, bê dudilî îspat dike.

Dagirkeriya Tirk êrişên hovane li dijî gel û herêmên me didomîne û bi berdewamî gefan li wan dixwe û careke din hewla xwe ya ji bo pêşkêşkirina alîkariyan ji bo vejandina DAIŞ’ê û peydakirina pêgeheke ewle ji bo wê nîşan dide li ser hesabê ewlekarî û aramiya bi milyonan xelkên Bakur û rojhilatê Sûriyê ku her tim rastî êrişên dualî yên DAIŞ û Tirkiyê tê. Di demeke ku em û hevkarên xwe balê dikişînin ser tunekirina şaneyên terorîst, dewleta dagirker hemû şaneyên xwe bikar tîne da ku ewlehî û aramiya herêmê têk bibe û jîngeha ewle ya xelkê heremê ku di dema borî de ji destê DAIŞ`ê hatin rizgar kirin, têk bibe.

Hêzên me bi berpirsyarî tê dikoşin û şervanên xwe yên herî binirx feda dikin ji bo dabînkirina paşerojeke ewle ji bo gelê me û herêmê. Ji tekoşîna me ya bi nirx tu carî dev jê nayê berdan û bi dilsoziya bi xwîna şehîdên xwe re, em dê li ser şopandina rêbazên berxwedanê yên nûjen ji bo têkbirina dagirkeriya dewleta Tirk û rizgarkirina herêmên xwe yên dagirkirî, berdewam bin.”

# Polîsên Tirk 11 rojnamevan destgîr kirin

**Navenda nûçeyan**



**Serê vê sibehê polîsên dewleta Tirk a dagirker li 21 bajarên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê bi ser malan de girt û tevî gelek siyasetmedar û hunermendan, 11 rojnamevan jî destgîr kirin.**

Beriyahilbijartinên serokkomariyê û yên parlamenteran ên Tirkiyeyê ku jê re 19 roj mane, îro danê sibehê polîsên dewleta Tirk li 21 bajarên Bakurê Kurdistanê û Stenbolê bi ser gelek malan de girt.

Polîsan li Amed, Mêrdîn, Sêrt, Çêwlig, Wan, Şirnex, Êlih, Dîlok, Riha, Bursa, Stenbol, Îzmîr, Mêrsîn, Mûş, Bedlîs, Colemêrg, Osmaniyê, Sêwas, Meletî, Semsûr û Enqereyê bi ser bi dehan mal û kargehan de girt. Di serdegirtinan de hinek pirtûk û materyalên dijîtal hatin desteserkirin.

Polîsên Tirk edîtorê Ajansa Mezopotamyayê (MA) Adurrahman Gok, nûçegihanên MA’yê Ahmet Kanbal û Mehmet Şah Oruç, gerînendeyê karên nivîsan ê rojnameya Yenî Yaşamê Osman Akin, xwediyê îmtiyazê yê rojnameya Xwebûnê Kadrî Esen, edîtora JINNEWS’ê Berîtan Canozer, rojnamevan Salih Keleş, Remzî Akkaya, Mehmet Yalçin û Mîkaîl Barût destgîr kirin.

Hate zanîn ku rojnamevan bi îdiaya “endamtiya rêxistinê” hatine destgîrkirin.

# 32 partiyên siyasî destek dane beyannameya Rêveberiya Xweser

**Navenda nûçeyan**

**32 partî û hêzên siyasî desteka xwe ji beyannameya Rêveberiya Xweser a ji bo çareserkirina krîza Sûriyeyê re anî ziman û gotin: Ew destek û piştgiriyê didin vê beyannameyê.**

Partî û hêzên siyasî bi daxuyaniyekê piştgiriya xwe ji beyannameya Rêveberiya Xweser re nîşan da û got: “Em wek hêzên siyasî yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji bo çareserkirina pirsgirêk û dozên bingehîn li Sûriyeyê em bi diyalogê bawer in. Her wiha em banga biratî, jiyana hevbeş û çareyên siyasî yên demokratîk dikin.

Partî û saziyan di daxuyaniya xwe de got: “Me rojekê jî hewl neda xwe ji Sûriyeyê qut bibin. Lê dijminên demokrasiyê û hin alî propogandaya vê yekê dikin. Projeya me ji destpêkê ve eşkere ye; Sûriyeyeke demokratîk, pirrengî û nenavendî. Lê aliyên me bi qutbûn û parçebûnên tawanbar dikin, di serî de dewleta Tirk, hewl didin erdnîgariya Sûriyeyê parçe bikin û siyasetên wê, vê yekê misoger dikin.”

Di dawiya daxuyaniyê de ev hate gotin: “Em partî û hêzên siyasî, destek û piştgiriyê didin vê



beyannameyê. Em xwestek û cidiyeta xwe ya ji bo çareyeke siyasî ji krîza Sûriyeyê re nû dikin, nexasim me gelek însiyatîf û nexşerê ji bo çareserkirina krîzê pêşkêş kirin. Em ji bo bidawîkirina krîzê, bi çareya siyasî bawer in û destekê didin beyanameya Rêveberiya Xweser û hemû însiyatîfan, bi taybet daxuyaniya yekemîn a Cinêvê, biryara 2254`an û biryarên navneteweyî yên têkildarî.”

Partiyên ku destek û piştgirî dane beyannameya rêveberiya bakur û rojhilatê sûriyê ev in.

Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD), Partiya Kesk a Demokratîk, Partiya Aştiya Demokratîk a Kurdistanê, Partiya Komunîst a Kurdistanê, Partî Demokrat a Kurdistanê-Sûriye, Partiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê, Partiya Çepgir a Kurd li Sûriyê, Partiya Çepgir a Demokratîk a Kurd li Sûriyê, Partiya Sûriya Pêşerojê, Partiya Guhertina Demokratîk a Kurdistanê, Partiya Nûkirin a Kurdistanê, Partiya Karker a Kurdistanê, Desteya Nîştimanî ya Erebî, Partiya Nûjen û Demokrasiyê ya Sûriyê, Partiya Wîfaq a Demokratîk a Kurd li Sûriyê, Partiya Refom –Sûriye, Partiya Asûr a Demokratîk, Partiya Biratî ya Kurdistanê, Partiya Roj a Demokratîk a Kurd li Sûriyê, Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM), Kongra Star, Partiya Muhafizkeran, Şepêla Pêşerojê ya Kurdistanê, Partiya Demokratîk a Kurdistanê-Rojavayê Kurdistanê, Heyet Tensîq El Wataniye-Tevgera Guhertina Demokratîk, Partiya Yekitiya Suryan, Partiya Kombûna Nîştimanî ya Kurdistanê, Partiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê (Partî), Partiya Yekitiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê (Yekîtî) û Şepêla Çepgir a Şoreşger a Sûriyê.

# "Beyannameya Rêveberiya Xweser kilîta çareseriya kirîza Sûriyê ye"

**Siyastmedar û nivîskarên bakur û rojhilatê Sûriyê diyar kirin ku benameya Rêveberiya Xweser ya ku di 18'ê Nîsanê de hat ragehandin bingeha çareseriya kirîza Sûriyê ye.**

**Navenda nûçeyan**

Ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê ku ev 12 sal dirêj kir û bû sedema kuştina 100 hezaran kes, herwiha ji bo bidawîkirina dagirkeriya li ser xaka Sûriyê, Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di 18`ê Nîsana 2023'an de beyannameyek ku ji 9 xalan pêk tê, eşkere kir. Rêveberiya Xweser di beyannameya xwe de girîngî da yekitiya xaka Sûriyeyê û diyar kir ku ew amade ye bi hikumeta Şamê û tevahî aliyên Sûriyeyê re diyalog û hevdîtinan bike. Derbarê girîngiya beyannameya Rêveberiya Xweser ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê û xalên wê beyannameyê, endamê Meclisa Giştî ya Meclisa Sûriya Demokrat Ezher Ehmed û nivîskarê Kurd Mustyefa Ebdo ji me re axivîn.

**'Hêzên navnetewî kirîza Sûriyê gurtir kirin'**

Ezher Ehmed diyar kir ku ji destpêka kirîza Sûriyê ve, gelek hêzên navneteweyî û herêmî ji bo berjewendityên xwe destwerdana kirîzê kirin û wiha domand: "Van hêzan ji bo ku armancên xwe bi dest bixin, kirîza Sûriyê kurtir kirin û temenê kirîzê jî dirêjtir kirin. Ji bo dîtina çareseriyekê ji kirîza Sûriyê re bi 10'an civîn, konferans, peyman û rûniştinên navnetewî hatin lidarxistin. Wekî Asîtana, Socî û Cinêvê. Lê ji her kesî re eşkere bû ku tevahiya van civîn û peymanên yên ji bo dîtina çareseriyê bê encam man. Herwiha hat eşkerekirin ku



her aliyek ji bo berjewendiyên xwe kar dike û tu aliyek ji yên ku beşdarî civînan dibin nûnertiya gelên Sûriyê nakin. Ji ber wê tu çareserî nehat dîtin."

**'Rêveberiya Xweser ji bo berjewendên gelên herêmê xebatê dike'**

Ezher da xuyakirin beannameya Rêveberiya Xweser ya ku di 18'ê Nîsanê de hat eşkerkirin, riya tekane ya çareserkirina kirîza Sûriyê ye û wiha got: "Yê ku nûnertiya gelê Sûriyê dike û gelek Insiyatêf ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê ragehandine, Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê ye. Rêveberiya Xweser ji destpêka damezrandina wê ve û heta niha, gelek kar û xebatên ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê, kirin e. Herwiha herdem banga yekrêziya aliyên Sûrî dike. Ji bo dîtina çareseriyê herdem li pêş e û destê xwe ji tevahiya aliyên Sûrî re vedike."

**'Rêveberiya Xweser deriyê xwe ji tevahiya aliyên Sûrî re vedike'**

Ezher da zanîn ku tevî hemû hewldanên Rêveberiya Xweser yên ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê, hkumeta Şamê zihniyeta xwe neguhert û bi neyênî nêzî hewldanên Rêveberiya Xweser dibe û wiha axivî: "Rêveberiya Xwese herdem dide xuyakirin çareseriya kirîza Sûriyê tenê bi diyaloga Sûrî-Sûrî ye, lê hikumeta Şamê hişmendiya xwe ya desthilatdar neguhert û bi neyênî li danûstendinên Rêveberiya Xweser dinêre. Hikumeta Şamê li hemberî daxwzên gelên Sûriyê guhê xwe digre û ti giraniyê nade insyatîfên çareseriyê. Heta niha zêzîkbûna hikumeta Şamê ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê, neyênî ye û guhê xwe ji daxwazên gelên Sûriyê digre ."

**'Beyannameya Rêveberiya Xweser bingeha riya çareseriyê ye'**


Ezher derbarê beyannameya Rêveberiya Xweser ya Rêveberiya Xweser a 18 Nîsanê wiha got: "Beannameya Rêveberiya Xweser çareya yekane ya kirîza Sûriyê ye. Ji ber ku beyannameyê çareseriya tevahiya aliyên kirîza Sûriyê girtiye dest. Ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê heta niha ji bilî Rêveberiya Xweser tu alî hewildanên cidî nake. Rêveberî bi her awayî hewil dide çareseriyê bîne.Wê gelek astengî ji aliyên hêzên desthilatdar ve bên derxistin, ji ber ku ew naxwazin beyannameya Rêveberiya Xweser bighêje armanca xwe. Hêzên dagirker dixwazin dema kirîza Sûriyê dirêjtir bikin.
Endamê Meclisa GIştî a Meclisa Sûriya Demokratîk Ezher Ehemed da dawiya axaftina xwe de Ji tevahiya gelên Sûriyê xwest



ku piştgiriyê bidin beyannameya Rêveberiya Xweser û ji bo dîtina çareseriyê bi erkê xwe rabin.

**'Beyannameya Rêveberiya Xweser kilîta çareseriya kirîza Sûriyê ye'**

Di heman çarçoveyê de nivîskarê Kurd Mistefa Ebdo da zanîn beyannameya Rêveberiya Xwese kilîta çareseriya kirîza Sûriyê ye û wiha got: "Hêzên ku ji bo berjewendiyên xwe li ser xaka Sûriyê ne, tu çareseriyê nayînin, tenê Rêvberiya Xweser ji bo berjewendiya gelên Sûriyê kar dik. Beyannameya Rêveberiya Xweser wê bigihêje armanca xwe û çareseriyeke mayinda peyda bike. Di daxuyanioya Rêveberiya Xweser de hat eşkerkirin ku beyannameya rêveberiyê wê gelek encamên baş bi xwe re bîn e. Em dikarin piştrast bikin ku Rêveberiya Xweser ji destpêka damezrandina xwe ve, bi berdewamî amadebûna xwe ji bo gihiştina çareseriyên lihevhatî bi rêya danûstandin û diyalogê nîşan daye û di parastina yekrêziyê de rolek girîng lîstiye. Divê her aliyên Sûrî ku dibêjin em welatparêzin, piştgiriya beyannameya Rêveberiyê bikin."



## Dijberiya DYE û Çînê dewam dike

**Ahmet AKTAŞ**

Çîn, gav bi gav destê xwe dirêjî qadên ku DYEyê lê serdeste dike.
Herî dawî dest avêt pirsgirêka Israil û Flistînê. Ji bo ku aştiya navbera wan sererast bike û pirsgirêka navbera wan a bi dehsalane dewam dike çareser bike, li gel wezîrên derve yên herdû welatan jî têkilî danî.
Jixwe hewldana Çînê ya herî balkêş a van rojên dawî, têkilî û peywendiyên li gel Siûdî û welatên Kendavê bû.
Her wiha ji bo ku karibe di pirsgirêkên vê herêmê de erkeke giring û encamgir bi dest bixe, gava pêşî Îran û Erebistana Siûdî li hev anî. Ji ber ku van herdû dewletan, di vê herêmê de weke kilîta çereserkirina pirsgirêkan e, wezîrên derve yên herdû dewletan vexwende Pekînê û li hev rûniştin.
Piştî van hevdîtinan, şerê li Yemenê ber bi rawestandinê ve diçe.
Erebistana Siûdî, biryar stand ku bibe endamê Rêxistina Hevkariyê ya Şenghayê(29.3.32023)! Dibe ku ya DYEyê zêde hêrs bike ev mijar be.
Têkiliyên Îranê, li gel Yekîtiya Mîregtiyên Ereban jî destpêkiriye û rojane xurt dibe.
Hewldanên diplomatik ên li gel dewletên Ewropayê jî zêdetir dibin.
Bi taybetî DYEyê, ji têkiliyên Elmanya û Çînê bi xof e û gelek hêrs dibe. Li gor saloxan Macron û Von Der Leyen(him wezîra berê ya Elmaniya bû û niha jî rêveberek bilind a YEyê ye), di rojên pêş de li gel Serokê Çînê Şî hevdîtinê pêktînin!
Yek ji hewldanên balkêş ê Çînê jî, dixwaze di ser Iraqê û Tirkiyê re derbasî Derya Spî bibe. Ji bo vê yekê, amadekariya çêkirina rêyeke nû ya hesin a tirênê jî dike.
Li Semerqenda paytexta Ozbekistanê Civîna wezîrên derve yên Çînê, Rûsyayê, Îranê û Pakistanê, bi mijara Efxanistanê li hev rûniştin(12.4.2023).
Helbet van hewldanên Çînê, DYEyê gelek nerehet û hêrs dike. Bêguman ew jî li himberî vê tevgera Çînê bê bersiv namîna.
Tê zanîn di herdû mehên dawî de, trafika diplomasiya xwe ya Bexdayê û Rojava(bakur-rojhilatê Sûriyê) xurtir kir. Wezîrê xwe yê Bergirî, Serokerkanê Artêşê û hijmarek misyonerên xwe yên giregir şand vê herêmê.
Tê gotin ku şandeyek ji rêveberiya Rojava û Mezlûm Ebdî jî di nav de, vexwendine Washingtonê. Dibêjin ev şande, wê li gel Biden, senatoran û parlemenan jî rûne.
DYEyê, Japonya û Koreya Başûr dest bi tetbiqatek berfireh kirin e.
Bi giştî mirov bala xwe didê hewldanên DYEyê, ji yên Çînê lawaztir in. Dibe sedem; ji ber kû giraniya xwe berdan e ser şer û cenga Ukrayna yê, û giranî dane mezinkirina NATO.
Mijareke din a giring û têkildarî doza gelê Kurdistanê jî ev e: Pêşbînî û gûmana xurt heye kû, DYE û YEyê, dixwazin di hilbijartinan de eniya CHPê(hevgirtina Milet) bi ser bixin.
Li Başûr jî eniya YNKê derxin pêş.
Lê belê wisa tê xuyakirin kû, DYEyê û hinek dewletên Ewrupayê, bi giştî hinek gringî dane têkiliyên li gel Tevgera Gelê Kurdistanê, bi taybetî jî trafîka Başûr û Rojava zêdetir kirin e. Jixwe mijara giring û yekser têkildarî gelê Kurdistanê jî, ev e.
Ji vê qonaxê û pêde encam, dimîne li ser zîrektî û hostatiya Tevgera Azadiya Gelê Kurdistanê!
19.4.2023

# Li hember êrişên dewleta Tirk hemleya hashtagê

**Tevgera Azadiya Komalgeha Kurdistanê li hember êrişên dewleta Tirk a dagirker li dijî herêmên Başûrê Kurdistanê hemleyeke hashtagê da destpêkirin. Tevgerê banga tevlêbûnê kir.**

Tevgera Azadiya Komalgeha Kurdistanê li bajarê Silêmaniyê yê Başûrê Kurdistanê civîneke çapemeniyê li dar xist û destpêkirina hemleya hashtagê li hember êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî Başûrê Kurdistanê ragihand.

Tevgerê di daxuyaniya xwe de destnîşan kir ku dewleta Tirk a da-



girker Başûr û Rojavayê Kurdistanê dike hedef. Her wiha diyar kir ku heke hevkariyek bi hêzên navxweyî re tune be, dewleta Tirk nikare êriş bike.

Tevgerê got: "Li aliyekî berhemên herêmê radestî Tirkiyeyê kirin û li aliyekî din, derî ji wan re vekirin ku bi dehan baregehên leşkerî ava bike, hawîrdor û xwezaya Kurdistanê binpê bike."

Tevgerê da zanîn ku di 2 salên borî de dewleta Tirk a dagirker bi dehan caran û bi çekên kîmyewî Başûrê Kurdistanê topbaran kir û di encamê de gelek welatî bûn qurbanî û xwezaya herêmê wêran bû.

Tevgerê bang li her kesî kir ku li hember dagirkeriya Tirk helwestekê nîşan bidin û rê li pêşiya destwerdana wê bigirin. Her wiha tevgerê banga tevlêbûnê kir.

Hemleya hashtagê dê 26`ê Nîsanê (sibê) dest pê bike. **ANHA**



# "AKP'ê, kirîzên Tirkiyê û Rojhilata Navîn gurtir kir"

**Serokê Partiya Çep a Kurd li Sûriyê Mihemedê Mûsê diyar kir ku serkeftina Partiya Çepên Kesk wê bibe bingeha qunaxeke nû li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê û got, AKP'ê Tirkiyê ber bi hilweşandinê ve bir û kirîzên Rojhilata Navîn gurtir kir.**

**Reşo Qamişlo/ Qamişlo**

Di 14'ê Gulanê de wê li seranserî Bakurê Kurdistanê û Tirkiyayê hilbijartinên perlemanto û Serokkomariya Tirkiyê bên lidarxistin. Herwiha wê di van hilbijartinana de 36 partiyên siyasî beşdar bibin. Ev demeke bi milyonan welatiyên Bakurê Kurdistan û tevaya Tirkiyê amadehiyên xwe ji bo van hilbijartinan dikin.
Di derbarê hilbjartinên Tirkiyê yên 14'ê Gulanê de, serokê Partiya Çep a Kurd li Sûriyê Mihemedê Mûsê ji rojnameya me re axivî.

**'AKP`ê ji bo ku li ser deshilatdariyê bimîne êrîşî here derê dike'**

Mihemedê Mûsê di derbarê êrîşên hikumeta AKP`ê yên ser welatên derdorê û siyasta dewleta Tirk a qirker, wiha got: "Di dema derbasboyî de, dewleta Tirk ya faşist xwest sînorê xwe berfirehtir bike û xewna xwe ya Osmaniya Nû pêk bîne. Ji ber wê êrîşên xwe yên ser tevahiya Kurdistanê û gelek welatên derdora xwe zêdetir kirin. Herwiha bi nêzbûna dema hilbijartinên giştî yên Tirkiyê re, dest bi êrîşên xwe yên berfireh li ser Başûr û Rojavayê Kurdistanê kir. Armanc ji van êrîşan qirkirina gelê kurd e. Herwiha dixwaze ji faşîstên Tirkiyê re bide xuyakirin ku hebûna gelê kurd li Başûr û Rojavayê Kurdistanê li ser Tirkan xeter e. Lewma bi awayekî hovane herdem êrîş dike û gelek kumkujiya pêk tîne. Erdogan bi pêkanîna siyaseta xwe ya faşîst rewşa hundrîn ya Tirkiyê xiste nava aloziyekê siyasî,aborî û civakî de. Êdî gel ji ber vê yekê nema siyaseta Erdogan qebûl dike. Kiryarên Erdogan wê bibin sedema hilweşandina AKP'ê û desthilatdariya wê ya faşîst. Di heman demê de wê Partiya Çepên Kesk encamên




girîng bidest bixe."

**'AKP`ê wê bi hemû awayan hewl bide ku bi ser bikeve'**

Mihemedê Mûsê di berdewamiya axaftina xwe de da zanîn ku AKP`ê wê bi hemû rêbazan hewl bide ku ew bi ser bikeve û wiha domand: "Hikumeta desthilatdar ya AKP`ê herdem ji bo mayndekirina serweriya xwe dikeve nava liv û tevgerê de, herwiha ji bo bi ser bikeve bi encamên hilbijartinan dilîze. Di hilbjartinên îsal de jî, dixwaze rêbazên sextkariyê bikar bîne. Herwiha mînaka sextekariya hilbijartinên borî, li ber çavên her kesî ye. Lewam vê carê jî pêkan e ku desthilatdariya AKP`, ji bo ku bi ser bikeve rêbazên sextekar bikar bîne. Li hemberî wê jî pêwîste partiyên Siyasî yên alîgirên demokrasiyê û bi taybetî jî Partiya Çepên Kesk, hişyar bin. Herwiha divê şopandineke baş ji aliyê Rêxistinên Navneteyî ve,li ser van hilbijartinan bê kirin."



**'Serkeftina Partiya Çepên Kesk wê bibe bingeha merheleyek nû'**

Serokê Partiya Çep a kurd li Sûrî,Mihemedê Mûsê di dawiya axaftina xwe de dest nîşan kir ku ger Partiya Çepên Kesk di hilbijartina de bi ser bikeve wê bandoreke erînî li rewşa hundirîn ya Tirkiyê û ya herêmî li Rojhlata Navîn û Kurdistanê bike û got: "Bi serkftina Partiya Çepên Kesk û hêzên demukratîk, di hilbijartên Tirkiyê de û bi binketina AKP`ê re, wê guhertineke siyasî û aborî di Rojhilata Navîn de çêbibe. Herwiha wê hemû pirsgirêkên hundirîn yên siyasî, aborî û civakî çareser bibin. Ne tenê rewşa hundirîn wê were guhertin, lê wê pirsgrêkên herêmî jî werin çareserkirin, herwiha wê ev guhertin bandoreke erênî li rewşa siyasî ya Rojava û başûrê Kurdistanê bike,bi şikandina Erdogan û partiyên faşîst yên girêdayî wî re, wê rewşa Tirkiyê bi giştî bê guhertin. "

## Hilbijartinên 14'ê Gulanê ji Rojhilata Navîn re jî girîng in

**Zekî BEDRAN**



Weke ku hilbijartinên li Tirkiyê ji pêşeroja welat re girîng in, heman demê de ji Rojhilata Navîn û welatên din ên herêmê re jî girîng in. Komara Tirkiyê ji avabûna xwe heta niha ket û rabû di rêya demokrasiyê de bi têkoşînê hinek destkeftî bidest xist. Niha Tirkiyê li ber xeteriyê ye ku van destkeftiyan jî winda bike. Bi desthilata AKP-MHP'ê re avabûnek faşîst çêdibe. Her ku çû dewlet çetewarî bû, hindirê tevahî saziyan hat valekirin, zagon hatin wê rewşê ku nayên pêkanîn. Welat, weke Elmanyaya Hitler, hertim bi dijminên hindirîn û derve re di nava têkoşîn û aloziyan de hat rêvebirin. Ev terzê rêveberiyê, netewperestî û milîtarîzma li ser dijminahiya Kurdan hat pêşxistin, bi êrişên li ser welatên heremê û tevgerên dagirkeriyê re rê ji karesatan re vekir.
Dewleta Tirk, şerê hindirîn ê li Sûriyê kişande nava girdavek bi xwîn. Vê jî têrê nekir, bi xwe bi dehezaran hêzên çekdar berhev kir, xwest rejîmê hilweşîne û bi destê îxwaniyan dewletek girêdayî xwe ava bike. Piştgiriya rêxistinên hov ên weke DAIŞ û El- Nûsrayê kir, tifaq çêkirin. Niha jî van çeteyan li herêmên ku dagirkeriyê dihewîne, piştgiriyê dide wan û hevkariyê dike. Bi bermayên van rêxistinan û çeteyên ji hêzên din berhev kirî, bi navê Artêşa Netewî ya Sûriyê li dijî rejîmê artêş û hikumetek alternatîf ava kir. Herêmên weke Efrîn û Serêkaniyê dagir kir. Li Idlibê parastina El- Nûsrayê kir. Herêmên ku dagir kiriye, di êrişên li ser herêmên din de weke baregeh bikar tîne. Hewl dide qirkirina Kurdan temam bike û herêmên xweser ji holê rake.

Çeteyên ku li Sûriyê bi çek kiribû, di şerê navxweyî yê li Lîbyayê de bikar anî. Ew der jî tevlîhev kir û xwest qadên serweriya xwe berfireh bike. Li Iraqê êrişên leşkerî yên mezin pêk anî. Bi dehan baregehên leşkerî ava kir. Taybet qadên ku hêzên gerîla lê bi cih kirine kir armanc, ev kir hêncet û li herêmê bi dehhezaran leşkerên xwe bi cih kir. PDK jî xist bin venêrîna xwe û petrola Iraqê ne li gorî zagonan herikand Tirkiyê. Di aliyê aborî de herem kir rewşek mêtîngehiyê de. Serweriya Iraqê û qada hewayî hertim binpê dike. Tirkmenan bi çek dike, dibêje Kerkûk Tirk e û îdîa dike ku mafê wî li ser heye. Di rastiyê de dixwazin ji Helebê, heta Mûsil û Kerkûkê dagir bike û bi axa Tirkiyê ve bide girêdan. Dibêjin, jixwe ev ax di nava sînorên Mîsaka Millî de bûn, ji Tirkiyê hatine standin.
Êrişên li ser Kurdan û hewlên temamkirina projeya qirkirina sedsalî li aliyekî, êdî serîtewandina tevahî welatên herêmê û niyeta belavkirina serweriya wan eşkere ye. Weke tê zanîn di pirsgirêk û nakokiyên di navbera Ermenîstan û Azerbaycanê de bûn alî û êrişî Ermenîstanê kirin. Niha jî di wê çeperê de destwerdanê dikin û weke hêza tevdêr disekinin. Îran jî kirin armanc, Azerî provekе kirin û dest avêtin hindir. Jixwe Yûnanîstan weke pariyê biçûk tê dîtin. Hertim bi gefan re rûbirû ye. Qibris hat dagirkirin û parçekirin.
Li gel tevahî hewlên NY, Ewropa û DYE yê ev 50 sale dagirkerî didome. Tirkiyê gef li tevahî welatên Ereban xwar û kêmxistin. Qeter xist bin parastina xwe, xwest çokên welatên din bişkîne û serweriyê çêbike. Meydan ji Îsraîlê re xwend, hewl da xwe weke rêberê cîhana Îslamê û rizgarkerê Filistîniyan bide nîşan. Xwest Îranê li herêmê teng bike. Rojhilata Navîn jî derbas kir, SÎHA firotin Efrîqayê, destwerdanî pirsgirêkên navxweyî kir û hewl da bandorê ava bike
Ji vê wêdetir, Erdogan NATO û DYE di aliyên cuda de kir armanc, tengav kir. Rûsya bikar anî û hewl da li Sûriyê mayînde bibe. Ji bo DYE yê ji Sûriyê derbixe, bi Rûsya û Îranê re hevkarî kir.
Bi kurtahî weke ku me li bîr anî, tifaqa Erdogan û Baxçelî herêm jî derbas kiriye û hatine wê rewşê ku gefê li herêmê dixwin. Îro Tirkiye di wê rewşê de ye ku terorê berbelavî cîhanê dike. Di vî alî de hilbijartinên li Tirkiyê tevahî herêmê têkildar dike. Qasî ku tê dîtin welatên rojavayî piştgiriya Erdogan nakin. Hîn zêdetir bi bêdengî temaşe dikin, lê Rûsya bi awayek vekirî piştgiriya Erdogan dike û ji bo serkeftina wî dixebite.
Eger Erdogan hilbijartinê winda bike, dê encamên wê biteyîsin herêmê. Kemal Kiliçdaroglu û tifaqa ku avakiriye, li Sûriyê weke niha têkiliyan bi çeteyên çekdar ên wek DAIŞ û El- Nûsrayê re nadomînin. Kiliçdaroglu hîn zêdetir alîgirê muxatabgirtina hikumeta Sûriyê ye. Ji derveyî vê, li Başûrê Kurdistanê jî şer û têkilî bi heman şêweyî nadomin. Li wir jî dê Kiliçdaroglu zêdetir Bexdayê esas bigre. Jixwe, di hindirê Tirkiyê de têkiliyên bi Kurdan re weke demê Baxçelî û Erdogan nabin. Di vî alî de, hilbijartina ku wê di 14'ê Gulanê de pêk bê, ji Tirkiyê re xwedî giringiyeke dîrokî ye,di heman demê de ji welatên herêmê re jî girîng e.



## Heger Erdogan neçe!!!!!

**Farûk SAKIK**

Çi dibe bila bibe lê bila Erdogan biçe. Herkes dizane ku ew xwedî kîn û tolhildanê ye. Di sala 2015'an de di 7'ê Hezîranê de dema bi serê xwe hikûmetek ava nekir, ji bo tolê êrîşî kurdan û hêzên demokrasiyê kir. Li Pîrsûs û li gara Enqerê komkujî pêk anîn. Li dijî Kurdan şer da destpêkirin. Erîşî Rojava kir, hin herêm dagir kirin. Li gorî ku tê gotin, piştî hilbijartina 7'ê Hezîranê ji bo ku ji Selahadîn Demîrtaş heyfê bigre sond xwarî ye. Gotiye; "çi dibe bila bibe ez ê ji wî 'bi cirî' heyfa xwe bigrim". Wisa jî kir; di 4'ê Mijdara 2016'an de ew dîl girt.
Ha, hûn ê bêjin dema ku têk çû ev yek kir. Sibê têk here jî wê dîsa heman tiştan bike. Na, wê demê têkçûna xwe qebûl nekir, dewleta kûr girt cem xwe û ji nû de çû hilbijartinan. Divê di vê hilbijartinê de darbeyek wisa bixwe ku nikaribe wê dewletê û wê hêzê, cardin bigire kêleka xwe. Divê berçem, berçem here. Here ku cardin veneger e.
Me xwest bi bîr bixin ku neçe ew ê wan kiryarên xwe yên sala 2015'an dubare bike. Divê têkoşîneke bê navber û bê sekin were dayîn.
Lê heger di vê hilbijartinê de neçe wê di pêşerojê de çibike?
Ji 15'ê Gulanê ve wê dest bi tevgera xwe ya piralî ya qirkirinê bike. Ew ê wek tişta ku Srî Lanka anî serê Tamîlan, dîn bibe. Di sala 2012'an de ev pilan xistibû pratîkê. Lê têkoşîna kurdan û Rêber Apo pêşî lê girtibû û nehiştibû bi encam bibe.
Ger di 14'ê Gulanê de bi ser bikeve, parlamento û her sazî bê wate bibe.
Çiqas siyasetmedarên kurdan hene wê êrîşa wan bike. Çi anî serê Selahadîn Demîrtaş û hevalên wî, wê bîne serê wan jî.
Ger konjonktor guncav be, wê êrişî Rojava bike. Wê ji Kobanê destpêbike, tevgereke nû ya dagirkeriyê bide destpêkirin. Ji bo ku di vê dijminatiya xwe ya kurdan de pêdivî hebe, wê Beşar Esad re li hev bike. Beşar Esad jî têkneçûna xwe deklere kir û bi hemû dewletên Ereban re ket nav danûsitandin. Ji bo hejmara dijminên xwe kêm bike wê bi Erdogan re jî li hev bike.
Metirsiyeke din; Erdogan koalîsyona şerê li dijî kurdan ava kirî ye. Ev koalisyon ji Hizbul-Kontra HUDA-PAR, YRP û BBP'ê pêk tê. Piştî hilbijartinan van hêzan wê bixe dewrê. Hêzên wan ên çekdar wê li pey nêçîra kurdan bikevin. Divê ku hin tetîkêş jî ber bi Parîsê bi rê bikevin.
Heger di van hilbijartinan de faşîzm neyê rûxandin hemû destkeftiyên kurdan wê bikevin bin talûkeyeke mezin de.
Rast e, faşîzm her tim li ser esasê şexs pêş ketiye. Li Îtalyayê Musolînî, li Elmanyayê Hîtler, li Spanyayê Franco, li Perûyê Fujîmorî û li Şîlî Pînochet mînakên herî balkêş in. Faşîzma ku bi Musolînî, Hîtler, Franco, Fujîmorî û Pînochet re hat, bi wan re çû.
Lewma rûxandina desthilata Erdogan wê faşîzmê ji holê rake. Ji bo hilweşandina pergala ku wî anî. Xala herî girîng a ku divê were bîranîn ev e.
Erdogan ger bi ser bikeve dê dîn bibe. Ew ê bibe versiyonek Sedamê nû
Çi dibe bila bibe dive serdema yekzilamî biqede. Armanc ew e ku faşîzma li ser bingehê yek kesî bê rûxandin.
Rûxandina desthilata yek zilamî bi tenê bi berxwedanê pêkan e. Herkes û hemû îstastîk dibêjin ev desthilat, ev faşîzm wê were rûxandin. Ev sedî sed e. Lê divê ji bo ji sedî sedûyek em bi ser kevin xebat werin meşandin.